Fachberatungsstelle für sexuell missbrauchte Mädchen und junge Frauen

Wöhlerstraße 42 (Haus C)
30163 Hannover
Telefon 0511 855554
Faks 0511 855594
info@violetta-hannover.de
www.violetta-hannover.de

### DEMÊN SERLÊDANA BI RÊYA TELEFONÊ

| | |
|---|---|
| Sêşemê, saet | 16:00 – 18:00 |
| Çarşemê, saet | 9:00 – 11:00 |
| Pêncşemê, saet | 10:00 – 13:00 |

Li dervey van deman hun dikarin li ser bandê telefonê biaxivin, şêwirdariya şexsî tenê li gorî civanekî pêşwext dibe.

Piştgirî ji hêla DER PARITÄTISCHE UNSER SPITZENVERBAND

Nivîsîngeha şêwirdariya pispor ji bo keç û jinên ciwan, ku tecawziya cinsî li wan hatiye kirin




# Agahdarî ji bo mezinan

Violetta

## LI SER ME

Nivîsîngeha me ya şêwirdariya pispor ji sala 1989an ve wek berpirsê karê gencan çalak e.

Em li gorî bîrwarên bingehîn yên gelemperîbûnê, rakirina qedexebûnê, piştgiriya keç û jinên ciwan kar dikin.

Parastina ji birîndarkirineke nefsî ya nû daxwaza me ya herî giring e.

Em bi van çalakiyên xwe berê xwe didin keç û jinên ciwan, ku jiyê wan di navbera 3 heta 25 salan e û hem wan kesên nêzîkî wan, ku alîkariya wan dikin. Em her wiha berê xwe didin karmendên pispor yên dibistanan û baxçên zarokan û saziyên çareserkirina tendirustî û kesên xemxor, li dervey sînorên etnîkî, keltûrî, dînî û civakî.

Şêwirdariya me bê pere ye û eger daxwazî hebe hem bi dizî ve ye. Nivîsîngeha şêwirdariyê li gorî erkê nehêniyê kar dike û girêdayî bi şert û mercên yasayî ye.

Pisporên rengareng di tîmê me de kar dikin, wek jinên xwedan pîşeyên perwerdeyî, nefsî, çareseriya nefsî û pisporên çareserkirina birînên nefsî.

## BEXŞANDIN

**Violetta e.V. wek komeleke xêrxwaziya giştî hatiye qebûlkirin. Mirov dikare wan perê ku bi xêr dide me ji baca xwe bikuje û ew xêr yekser diçe ji wan kesên hewcedar re.**

## HISABÊ ME YÊ BANKÊ

**Violetta e.V. – Bank für Sozialwirtschaft**
**IBAN DE16 3702 0500 0008 4435 00**

## VIOLETTA ŞÊWIRDARIYÊ DIKE

- Çareseriya tendirustî û destnîşankirina nexweşiyan ji bo keçên 3 heta bi 12 salan
- Şêwirdarî û çareseriya tendirustî ji bo keç û jinên 13 heta 25 salan
- Şêwirdariya online ji bo keç û jinên ciwan
- Şopandina prosesê di warê nefsî û civakî de
- Şêwirdarî ji bo kesûkaran û kesên alîkar yên nêzîkî wan
- Şêwirdariya tekane û ya tîmî ji bo karmendên pispor
- Şêwirdariya pirsgirêkên mezin
- Şêwirdariya di rêya telefonê re

## VIOLETTA AGAHDAR DIKE

- Xwendina babetên nû ji bo karmendên pispor û belavkeran
- Xwendina gotaran, kombûnên pisporî û pêşengeh
- Civînên dayik û bavan
- Ahengên zaniyarî ji bo naskirina nivîsîngeha şêwirdarî ji bo şagirtan, xwendekarên mamosteyê û kesên beşê perwerdekariyê dixwînin
- Weşanên taybet bi me

## VIOLETTA HEVKARIYÊ DIKE

- Girêdana peywendiyan û hevkariyê bi nivîsîngehên şêwirdariyê û dezgehên herêmî û derveyî Herêmê re
- Nivîsîngeha Anstoß li dijî zordariya cinsî li beramber kuran û gencên nêr<br>Telefon 0511 123589-11, Herêma Hannoverê
- Nivîsîngeha şêwirdariyê li dijî tecawiziya cinsî li beramber zarokan û gencan<br>Telefon 0511 616-22160